Jîn

Jimara dûê | Heyva Xezîranê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Xwê u Runahî

Xwê. Xwê bu xoşkirna tamê u parêztina xwarinê tête bi kar înan. Heker xwarin çêkir xwê ji bîr bikit, xwarin bê tam e.

Xwê jî tişt parêz dikit; xwarnê ji genîatîê diparêzit. Ji berî kehreb u selace hebin, pîrêt we xwarin bi xwê parêztin. Wan qelî u spil çêdikirin, u ew xwarine gelek heyva man u genî ne dibî. Ḧeta ku me selace u micemîde hene, belê em her xwê bi kar tînîn bu gelek tişte wekî tirşîê, sîrkî, keşkê, ava temata u penîrî.

Runahî. Runahî di tarîê re diçit u em dişêîn bibînîn. Her dem runahî ji tavê u heyvê u stêra têt. Belê, di şikefta ve her tarî ye u runahî nîne.

Diz dizîa xu bi şevê dikin çunku bi şev tarî ye u runahî kêm e u kes nabînit da wan rawestînin u bigirin.

Jiberî dû sala hevala min (X-) xewnek dît u beḧsa xewna xu bu min kir. Xewna wê husa bî:

Tarîek mezin dît, u ew tirrsa. Dîv da runahîek bi meznatî dît, u ew pitir tirrsa.



Piştî hingê xanîek bîanî dît u çar şemalk dihilkirî tê da bîn. Hevala min gelek ḧeş runahîê şemalka kir u bi rê ve çû def wan.

Tu çi dibêjî? Mebesta xewna wê çi ye? Min eve gutê. Tarîa mezin Kurdistan e. (Min şîa bêjim ew tarîa mezin Emrîke ye yan behirek dî li cîhanê ye, bes mala wê li Kurdistanê ye.) Gelek tarî li Kurdistanê yê hey, wekî drewkirnê u gutinêt ne rast u gendelîê u ḧîlekirnê. Runahîek bi mezinatîa Xwidê ye, ku pîruz u dilpaqij u mezin u bi tirs e.

Xanîek bîanî u çar şemalk tê da xanîa min u sê hevalêt min li Dihukê bî ku (X-) hêş ne dîtî bî u ji ber hindê ew xanî bîanî bî bu wê. (Mirîem, Emîre, Kêtî u ez pêk ve li xanîek li Dihukê jîan demê me dersêt Inglîzî havîna 2004 dan.) Ez u hevalêt min bawerîa ‘Îsaî dikîn. ‘Îsa gut şagirdêt xu ku ew “runahîa cîhanê” ne, ye’nî ew wêne u runahîa mezinatî ya Xwidê ne.

Heker kesek “runahî” ye, karê wî harî karîa miruv (yêt li tarîê dijîn) da bibînin u gendelîê pêşçav bikit.

Ji ber hindê heker em Xwidê tirs în, pêtivî ye em wek xwê u runahî li komela xu da bîn. Pêtivî ye jîana me bi axiftin u karêt baş bête kirnê da komela xu ji şulê pîçkirnê parêzîn. U pêtivî ye miruv bişên çav li başîê u dilpaqijîê bikin. Bi taybetî bi komela Kurda ya gelek zî tête gihurînê, pêtivî ye em bimînîn bi qowet u bi rastî u qencî u paqijî. Ev kare bu me heker em ji Xwidê bitirsîn u ne hêlîn ser milê êke dî.

“Hîn xwê ya ‘erdê ne. Belê heker xwê sîratîa xu ber da, çawa dê careka dî sîr bite ve? Êdî bi kêr çi naêt u pavêjine ji der ve da xelik pê lê bikin! Hîn runahîa cîhanê ne. Bajêrekê li ser çîaî avakirî naête veşartin. Xelik çiraî hilnakin u binxêvin, belê di danite cihekê bilind da runahîê bidite hemî kesêt di malê ve. Bila bi vî rengî runahîa we beramberî xelkî run kit, da karêt we yêt çak bibînin u Babê we yê li esmana bi rumet bikin.”

- ‘Îsa (Mizgînîa Mettî 5:13-16)

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.